

"Ev film dê dîroka sînemayê biguherîne"

» RÜPEL 9



Çand û Hüner

Di 2010'an de dê bikevin jiyana me

» RÜPEL 8



Zanist

Versiyona çapkıra ya HAWAR NET.comê / Çapa Dijital / 20.12.2009

Hejmara ceribandinê

Rojnameya Kurdî a serbixwe

hawarnet.com

pesketin@hk-mg.net



Di 10 salêñ dawî heri
zêde kîjan nûçe hatin
xwendin?

10 salêñ dawi de heri zêde hatiye xwendin
û weşandina mijara "Bi hêz bûna Çin
e." rüpel 7



Hikûmeta
Yewnanistanê ber bi
îflasê ve diçe

Piştî ku derecuya krediya Yewnanistanê
ya ji ber nedayîna deynan daket,
hikûmeta Serokwezir Yorgo Papandireu di
rojêñ zor de derbas dibe. rüpel 7

Kjan welatan wê derbasi 4G bibin?
r.8

Katalanya got: Serxwebûn» r.7

Meksiqayê ceset êdî li ber rîyan e»
r.7

Ji bo tedawiya pêncêşêrê gaveke
giring

Dewama nûçeyê di rüpelâ 8'an de



Di konferansa NY ya li Kopenhagê de peymaneke derket holê lê naverok
gellek zeyif e. R7

Pêşketin

Dewleta Tirk êdî ji Kurdan re ji xeynî veqetinê riyek nahêle

- Hevserokê DTP'ê ya hate girtin Ahmet Turk, diyar kir ku biryara ku ji parlementoyê istifa nekin û di Partiya Aşî û Demokrasiyê de têkoşîna xwe bidomînin stendine
- Dinya elem girtina DTP şermezár, ji PDK û YNK deng derneket

Amed (Pêşketin): Dadgeha Makezagonê derbarê DTP'ê de biryara girtinê da. Bi girtina DTP'ê re, biryara xistina parlementiriya Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk û Parlementera DTP'ê ya Amedê Aysel Tugluk da.

Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk, piştî biryara Dadgeha Makezagonê ya girtina DTP'ê daxuyaniyek kurd da û diyar kir ku girtina partîyan nabe çareseri û têkoşîna wan a ji bo aşti û demokrasiyê dê bidome.

Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk, têkildarı biryara girtina DTP'ê daxuyaniyek kurd da çapemeniyê û diyar kir ku dé têkoşîna wan bidome..

Parlementerên DTP'ê biryar dan ku bi BDP li parlementoyê biminin

Hevserokê DTP'ê ya hate girtin Ahmet Turk ê qedexeya siyasi ye, diyar kir ku piştî nerin û daxwazên gel, saziyên sivil girtin û Abdullah Ocalan nîrxandin, biryara ku ji parlementoyê istifa nekin û di BDPde têkoşîna xwe bidomînin stendine.

Dewama nûçeyê di rüpelâ 4'an de



Parlementerên DTP'ê biryar dan ku bi BDP li parlementoyê biminin

Kesên bi sîlehan êrîşî Kurdish kîrin serbest hatin berdan, zarokêñ Kurd li zîndanan ne

Ji 3 kesên bi boneya li hemberî koma girtina DTP'ê şermezár dikir, êrîş çekdarî pêk anîne hatibûn binçavkirin, di nav demek kin de serbest hatin berdan. Lî zarokêñ Kurd ku sîca kevir avêtinê têne girtin cezayîn giran ên zîndanê dîgrin..» r.3

Şewba Berazan
dê zêdetir belav
be

Şewba Berzan bi sar bûna
hewayê dê zûtir belav be.
Dewama nûçeyê di
rüpelâ 2'de

Peykerê Şivan
Perwer li Sêwrekê
hate danîn

Şaredariya Sêwregê li navendê
peykerâ hunermend Şivan
Perwer çêkir
Dûrmahîk di rüpelâ 2'de

'Belgeyên derbarê
bombeşa nuklerî ya İranê
di destê me de ye'

Times idda kir ku di destê wan de
belgeya veşartî ku ıspat dike ku İran
bombeşa nuklerî dike.
Dewama nûçeyê di rüpelâ 4'de

Mirov beriya 105
hezar sal jî ard
çêdikirin

Li gor lêkolînke ku di kovara
"Science" de hatiye weşandin
mîrov beriya 105 hezar sal jî
ard çêdikirin. r5

Naveroka Din
» Zanist r.8
» Şirove r.5
» Aktuel r.10

Wê ji vir şûnde ci
be?
SERHAD B.RÊNAS

Aşitiya me erzan e, a we
bi ci ye gelo?!
FAHRI KARAKOYUNLU

Weşanen HKMG:

HAWAR NET hawarnet.com | MUZIKKURD muzikkurd.com SINEMAKURD sinemakurd.com |
ZANISTUTEKNOLOJI zanistuteknoloji.com KURDO kurdo.me | JINANE jinane.hk-mg.net |
ABORINAS aborinas.hk-mg.net HEMÛ: www.hk-mg.net

Meha pêşıya me de hay ji xwe hebin;

Şewba Berazan dê zêdetir belav be

Şewba Berzan bi sar bûna hewayê dê zûtir belav be.

AMED (Pêşketin)

Zanyar diyar dikin ku divê di meha kanûnê de bi derzi bûnî rî li ketina nexweşîya şewba berzan were girtin.

Her wiha té diyar girin ku bi xwarina zêde a meywe û sewzeyan divê mirov sistema xwe ya têkoşina bi nexweşîyan ji xurttir bike.

Berdevkê wezareta tenduristiyê yê hikûmeta herêma Kurdistanê Dr.Xalis Qadir rewşa dawîn ya

nexweşîya şewba berzan aşkere kir tî anî ziman, texmin wiha ne ku di meha bê de şepoleke din ya bapêşa berazan herêma Kurdistanê bigire nav xwe.

Dr.Qadir diyar kir di dema van du hefteyên dawiyê de serdankirina kesen bi nexweşîya bapêşa berazan ketine kêm búye û got: "Serdanakirina kesen bi wê nexweşîyê dikevin kêm búye û dikare bê gotin ew nexweşî li herêmê di bin kontrolê de ye.

Di dema du hefteyên bihûri de tenê kesekî ku bi bapêşa berazan ketiye, serdana nexweşxaneyê kiriye. Ev jî di demekê de ye ku di 15 rojên dawiyê yên meha bihûri de 15 kes bi wê nexweşîyê ketine."

Dr.Dadir her wiha got: "Tevî kembûna metirsîya şewba berazan li ser hemwelatiyan, lê li gor texmînan di meha bihûri de dê şepoleke din ya wê bapêşe bê herêma Kurdistanê." (HAWAR NET.com)



Pêykerê Şivan Perwer li Sêwrekê hate danîn

Şaredariya Sêwregê li navendê peykera hunermend Şivan Perwer çêkir

RIHA (Pêşketin)

Peykerê ku bi qasî 3 metreyan mezin e di nav du heman de hatiye çekirin.

Cigirê Şaredarê Sêwregê Mustafa Hivi Abikoglu

da zanîn ku ewê di rojên pêş de bi awayekî fermî vekirina peykerê pêk binin û ji bo merasima vekirina peykerê ewê Şivan Perwer ji vexwinin navçeyê.

Peyker ji ew wêneyê naskiri ku di desteki Şivan de tembûra wi û destê wi yê din ji bilindkiri û çarmérki runiştîye hatiye dizaynkarin. Lê divê moriv bibêje ku peyker gelleki amatori hatiye çekirin. (ajansan)



Berhem Salih gihişte Tehranê

Bi serdaneke fermî Berhem Salih serokwezîrê Kurdistanê bi serokatiya şandeyeke hikûmetê gihişte Komara İslâmî ya İranê



HEWLÊR (Pêşketin)

Beri birêketina serokwezir bo İranê di daxuyaniyekê de got ku armanc ji serdana şendeya herêma Kurdistanê bo Tehranê ewe ku ew dê li dor çend pîrsên girin ú aktuel bi berpîrsên iranî re gotübêj bikin ú got ku dê pîrsa bazirganiya di navbera Hewlêr û Tehranê de mijara serke be.

Her serokwezir Berhem Salih û şandeya pê recipina xwe ya yekê ya di çarçoveya vê serdanê de digel wezirê derive yê franê pêk bine. Şandeya hikûmeta herêma Kurdistan a bi serokatiya Berhem Salih ji Kerim Şngari wezirê navxwe, Sinan çelebi wezirê bazirganiyê û Cebâr Yawer berdefkê wezareta pêşmerge pêk tê.

Salih û şandeya pê re li firokexaneya Mihrabâdê ya li Tehranêji aliye berpîrsên wezareta derive ya İranê û jimareyek ji berpîrs û nûnerên hikûmeta herêmê li İranê hate pêşwazikirin.

10 daxwazên çareseriyê yên Maxmurê

HEWLÊR (Pêşketin): Meclisa Gel a Demokratik a Wargerâ Penaberan a Maxmûrê, daxwazên çareseriyê ku ji 10 xalan pêk té pêşkêsi heyeta DTPê ya hate girtin kirin. Welatîyên Qampê xwestin nexseriya Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan riyanî siyaseta demokratik bêne vekirin. Daxwazên Mexmûriyan Di dosyeyê de, ji bo rewşa vegerê û jiyanek hevpar çêbibe ev daxwaz hatin kirin:

1- Ji bo demokrakîkbûyina Tirkîyeyê ya rastin û aştiyek mayin de bê avakirin, lazime tecrida li hemberi Réberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bê bi dawikirin û pêşîya wi bê vekirin. Nexseriya ku ji bo pîrsîrêka kurd bi rî û rîbâzén aşiyêne siyasi û demokratik de bén çareserîkîn, bidin muhatabén têkîdar û ji rayagîsti re aşkere bikin 2-Bila operasyonên leşkerî bén bidawikirin, pêvçûn bén sekirinandin,

3-Pêşîya çareserîya pîrsîrêka kurd a aştiyane, demokratik û siyasi bê vekirin 4-Girêdayî demokrakîkbûyina Tirkîyeyê ya rastin, di esasa cidi girtina vîna gelê kurd de diyalog û muakere bén dest pê kirin. 5-Weki perçeyê neteweya demokratik a Tirkîyeyê di bingeha nasnameya me ya gelê kurd divê xwedi misogerîya makeqanûnê, hemwelatiyek azad, wekhevi û jiyanâ bi hev re

6- Li hemû qadan divê axaftina kurdî azad bibe. Divê rî li pêşîya hinbûn, pêşxistin û jiyanâ bi zimanê xwe ya nîrxên diroki, çandî û erdiyariya vebe. 7- Bi navkirina zarokên xwe yén kurdî, bi kurdî perwerde kîrin û mezinkirin 8- Wekî gelê kurd, dirok, çand, huner û wêjeya xwe azad jiyandina, pêşxistin û parastin

9- Ji bo jiyanâ bi ewlehi ya li gund, kasaba û bajarên Kurdistanê, divê ji pêkutî û zilma tevgerên taybet, cerdevan dûr bin, cihen xwedi derfetên bes bin û ji bo jiyanek misogerî pergala cerdevaniyê bê rakirin. 10- Bi çareserîkîna pîrsîrêka kurd a demokratik û aştiyane lazime li herêmê kurdan a Tirkîyeyê bi nasnameya xwe bijin û em ewlehiya xwe bi xwe çêkin, ciheki niştechiya komî bê çekirin û vegera me di bin konturola Neteweyên Yekbûyi (NY) de be.

Heyeta Kurdistanê li DYE ye

Heyeta hikumeta Kurdistanê beriya serdana Barzani li Emerîkayê.

HEWLÊR (Pêşketin)

Şandeya hukûmeta herêma Kurdistanê gihijt Amerika. Ev şandeya han ji serokê diwana serokatiya herêma Kurdistanê Fu'ad Huseyn,

berpîrsê fermangeha peywendiyên derveyên hukûmeta herêma Kurdistanê Felah Mustafa û nûnerê hukûmeta herêma Kurdistanê yê li Amerika Qubad Talebanî

pêkhatiye... Hêjayed gotinê ye, ku ji bo guft û gokirina pêşhaten evê dwiyê yên qada siyasiya Iraqê û herêma Kurdistanê, roja 11 evê mehê şandeyeka herêma Kurdistanê ber bi Amerika ve bi rî kevt..

"Kurd dikarin 65 kursiyan bi dest bixin"

Cigirê serokê Listeya Hevpemaniya Kurdistanê Seîd Berzincî da zanîn ku eger welatiyên kurd nemaze li navçeyên nakokbar herin ser sinduqên dengdanê, rîjeya kursiyên kurdan di parlamento ya bê ya Iraqê de dê wek xwe bimîne.

HEWLÊR (Pêşketin)

Berzincî got: "Me de pesendkirina qanûna hilbijartînê de bersiva plana mezin a li dijî kurdan da, di hemû haletan de kurd dikarin di hilbijartînê de 65 kursiyan bi dest bixin ku dike ji %20'ê

kursiyên parlamento ya û eger besdarbûna welatiyên kurd li jor ji %80'ê be nemaze li navçeyên nakokbar wê demê em dikarin 68 kursi ji bi dest bixin û rîjeya me dê bibe ji %21'ê."

Berzincî got: "Li hember pesendkirina qanûna hilbijartîna Iraqê, ji bo piştgirikirina bicihanîna madeya 140'ê û serjimara sala 2010'ê me ji Amerikayê nemaze ji serok Obama garanti wergirtiye.

Kesên bi sîlehan êrîşî Kurdan kirin serbest hatin berdan, zarokên Kurd li zîndanan ne

Ji 3 kesên bi boneya li hemberî koma girtina DTP'ê şermezar dikir, êrîş çekdarî pêk anîne hatibûn binçavkirin, di nav demek kin de serbest hatin berdan.

Lê zarokên Kurd ku bi súca kevir avêtinê têne girtin cezayên giran ên zîndanê digrin.

AMED (Pêşketin)

Dewleta Tirk bi her avayı nişan dide ku Kurdan weki hemwelati nabine û armanca serke tune kirina Kurdan e. Minaka heri dawi ji serbets berdana kesen ku bi çekan êrîş Kurdan kirine. Li aliyen Kurd zarokên Kurd ku bi súca kevir avêtinê têne girtin cezayên giran ên zîndanê digrin. Li Stenbolê doh Tirkan bi silehîn rasti di nava kolanan li ber çavê polisan gulle reşandin ser Kurdan.

Ji 3 kesên bi boneya li hemberî koma girtina DTP'ê şermezar dikir, êrîş çekdarî pêk anîne hatibûn binçavkirin, di nav demek kin de serbest hatin berdan. Selçuk U. bi boneya ji dozek din légerîna wî heye şandina Edliyeyâ Beyoglu. Bi wan êrîşan disa derket holê ku Tirk aştîyê naxwazin û tehemmûli Kurdan nakin, êdi bi hev re mayina Kurd û Tirkan ne mimkune, elwehiya Kurdan di nav sistema dewleta Tirk bi temami qediyaye û dîvê Kurd bigêhîjin statuyeke otonom.

Erîşkar Selçuk U., T. G. Ü S. Z. li ser talimata dozgeriyê serbest hatin berdan. Selçuk U. bi boneya ji dozek din légerîna wî heye şandina Edliyeyâ Beyoglu. Bi wan êrîşan disa derket holê ku Tirk aştîyê naxwazin û tehemmûli Kurdan nakin, êdi bi hev re mayina Kurd û Tirkan ne mimkune, elwehiya Kurdan di nav sistema dewleta Tirk bi temami qediyaye û dîvê Kurd bigêhîjin statuyeke otonom.



Malikî dixwaze Kurdan bo berjewendiya xwe bikarbîne

Dijminahiya Malikî li hember Kurdan bi dawî nabe. Berdevkê Hêzên Parastina

Endamê parliyamenta Iraqê Re'ûf Osman ê ser bi lista hevpemaniya kurdistanî ve da xuaykirin, ku serokê wezirén Iraqê Nûri Maliki dixwaze kurdan ji bo berjewendiyen xwe bi karbihine. Weha ji dihê çaverêkirin, ku serokê wezirén Iraqê di evê dema nézika pêş de serdana herêma kurdistanê bike.

Re'ûf Osman ji PNA re da xuyakirin, ku ev pirsa han ji girêdayî hilbijartinan e û Nûri Maliki her ji niha ve dixwaze, ku cih û warêne xwe berfireh bike. Re'ûf Osman got: Nûri Maliki dê her di evê çarçeweyê ji de serdana herêma kurdistanê bike.. Maliki dixwaze ku kurd piştevaniya wi bikin, da ku careka din bibe serokê weziran. Di beşeki dinê bêjedana xwe de Re'ûf Osman got: heger Maliki soz û peymanê xwe bi cih bihîne, dê kurd alikariya wi bikin..

“Hêzên pêşmerge wê nebin beşek artêşa Iraqê”

Herêma Kurdistanê Cebar Yawer aşkere kir, hêzên pêşmerge têkelî hêzên Wezareta Bervaniyê ya Iraqê nayê kirin ku ev yek di warê yasayî û destûrê de ne mumkin e..



AMED (Pêşketin)
Biryar e di van demen nêz de serokwezirê Iraqê Nûri Maliki û şandeye Wezareta Berevaniyê ya Iraqê serdana Herêma Kurdistanê bikin. Yek ji mijarén ku dê di navbera herdu aliyan de bê gotübêjîrin pirsa hêzên pêşmerge ye.

Derheqê vê mijarê de berdevkê Hêzên Parastina Kurdistanê Cebar Yawer ji malpera Sibeyê re ragîhand, dema serdana Maliki û wezirê berevaniyê Ebdulqadir Ubeydi hêj nehatiye diyarkirin. Derheqê ajandaya serdana Maliki de de Yawer aşkere

kir ku serdana Maliki ji bo çareserkirina pirsên hilawisti yên navbera Bexda û Hewlêre ye ku beşek ji wan taybet in bi hêzên pêşmerge yên Kurdistanê û budecaya pêşmerge ye. Yawer got: “Meseleya têkelkirina hêzên pêşmerge bi hêzên Wezareta Bervaniyê ya Iraqê re di warê yasayî û destûrê de nabe û nayê kirin.”

Fuad Hisê: Piştgiriya dawîn Amerikayê li Kurdan, bûyereke dîrokî ye

Serokê dîwana serokatiya herêma Kurdistanê Fuad Hisê ji rojnameya The Washington Times'ê re got: “İdareya Amerikayê dest bi piştgirikrina kurdan kiriye û amade ye di meseleya Kerkükê de navbeynariyê bike, ev ji di mejûya siyasi ya kurdan de rûdaneke girîng e.”

Fuad Hisê di çarçoveya serdana şandeya herêmê ya Amerikayê de ku çend roj berê çûbû Washingtonê, ji rojnameya The Washington Times'ê re got: “Ev mijar her tim li cem me nezelal bûye. Hikûmeta Washingtonê li hemberî kurdan helwesta xwe bi aşkereyi diyar nedikir. Lé vê carê bo cara yekemin Koçka Spî pêbendbûna xwe bi sozén ku dane mîletê kurd, ani ziman.”

Di berdewamiya axaftina xwe de Hisê aşkere kir, Koçka Spî di çarçoveya pirozbahîya ku bi munasebata pejirandina yasaya hilbijartinan pêşkêş kir de, bi taybeti sipasiya kurdan ji kîribû û got: “Koçka Spî her wiha di pirozbahîya de madeya 140°'ê ya destûra bingehin ji bi bir xistibû ku kurd, daxwaza bicihanina wê dikin.”

Şepolêkî befirbarîn Kurdistanî girtewe

Beşeweyekî cir û berdewam şepolêkî befirbarîn nawçekanî çiyaî Kodo û çiyaî Dulkey serbenawçey Pişderî girtotewe..

Be gwêrey serçawekan ta êsta pena û pênc santim bariwe berdewamişi heye çend rêgeyekî néwan gundekani nawçekes hatûçokirdîniyan zehmet buwe pêş binî dekirêt em befirbarine emroş berdewam bêt.



HAWAR NET / NÜÇE Û AGAHÎ
TU LI KÜ BÎ, NÜÇE LI WÊ DERÊ YE
hawarnet.com Kurdish û Kurdistanî

Dewleta Tirk ji Kurdan re ji xeynî veqetinê riyek nahêle

Dadgeha Makezagonê biryara girtina DTP'ê da. Ligel girtina DTP'ê Hevserokê Giştî yê DTP'ê Ahmet Turk û gelek parlementer jî di nav de, bi qedexekirina siyasetê hatin cezakirin

AMED-HEWLËR (Pêşketin)

Dadgeha Makezagonê derbarê DTP'ê de biryara girtinê da. Bi girtina DTP'ê re, biryara xistina parlamentiriya Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk û Parlementera DTP'ê ya Amedê Aysel Tugluk da. Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk, pişti biryara Dodgeha Makezagonê ya girtina DTP'ê daxuyaniyek kurd da û diyar kir ku girtina partian nabe çareseri û tékoşina wan a ji bo aşti û demokrasiyê dé bidome. Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk, têkildari biryara girtina DTP'ê daxuyaniyek kurd da çapemeniyê û diyar kir ku dé tékoşina wan bidome..

Bê guman bi diyalog û hevditinan pirsgerék çareser dibe. Em li pey biryara xwe ya ku me berê dabûn in. Çiqas em bêne asetngkirin bila bê asteng kirin, tékoşina me ya aşti û demokrasiyê dé bidome. Dê aşti û demokrasi bi ser bikeve. Em dê pêvajoyê bi heassi bişopinin. Ji niha û virde ji dé tekoşiena me bi dome. Qedexeya min û Tugluk, her wiha qedexeya 37 siyasetmedaran pirsgrêk çareser nake. Dê tékoşina me bidome. Niha hevalen me daxwaznameyên xwe yên istifadê amade dikin, dê daxwaznameyên istifayê bidin parlementoyê.

Em li pişt biryaren ku me berê girtibûn disekekin. Emê xebatên xwe yên ji bo aşti û demokrasiyê bidominin. Dê aşti û demokrasi hetmen biserkeve." Nûçeya biryara girtina DTP'ê, ji aliye ajansên cihanê ve ji wek "flaş" hate dayin. Associated Press, nûçea weha gihand aboneyên xwe: "Dadgeha Makezagona Tirk, biryara da ku partiya kurdperwer ji ber têkiliyên wê yên bi PKK'ê bê girtin." Ajansê nûçeyan ya din AFP'ye ji bi vê hevokê bûyer ragihand: "Serokê Dodgeha Makezagonê yê Tirk, da zanin ku, partiya kurdperwer hate girtin."



Ji bo 37 kesan qedexeya siyasetê

Heyeta Dodgeha bi hinceta ji ber daxuyaniyên wan ji bo 37 kesan biryara qedexeya siyasetê da. Kesén biryara qedexeya siyasetê li wah hate birin wiha ye: "Abdulkadir Fırat, Abdullah İsnâç, Ahmet Ay, Ahmet Ertak, Ahmet Turk, Ali Bozan, Ayhan Ayaz, Aydin Budak, Ayhan Karabulut, Aysel Tugluk, Bedri Fırat, Cemal Kuhak, Deniz Yeşilyurt, Ferhan Turk, Fettah Dadaş, Haci Uzen, Halit Kahraman, Hatice Adibelli, Huseyin Bektaşoglu, Huseyin Kalkan, Hilmi Aydogdu, İzzet Belge, Kemal Aktaş, Leyla Zana, Mehmet Salim Saglam, Mehmet Veysi Dilekçi, Metin Tekçe, Murat Avcı, Murat Taş, Musa Farisogulları, Necdet Atalay, Nurettin Demirtaş, Orhan Miroğlu, Sedat Yurttaş û Selim Sadak."

Selim Sadak: Tevgera kurd dê xurtir be

Saredarê Sérêtê yê DTP'i Selim Sadak ku ji 38 kesen yek e ku wan re qedexekirina siyasetê hatiye got, dê tevgera kurd ji vir û pê vê hêj xurtir bibe û di hilbijartinek ditir de kurd ji 30'ê jortir parlamenteler bişinîn parlamentooyê. Sadak daxuyaniyek da û got, divê édi bê ditin ku bi girtina partian re pirsgerék nayê çareserkirin. Kurd édi tundiye naxwazin û li aliye yekbûnê de ne.

Dinya elem girtina DTP şermezar, ji PDK û YNK deng derneket

Komîsyona Sivil a Yekitiya Ewropayê û Tirkîyeyê girtina DTP'ê tundi şermezar kir Komîsyona Sivil a Yekitiya Ewropayê ya Tirkîyeyê (EUTCC) Biryara Turkiyê ya girtina DTP'ê bi tundi şermezar kir.

Li Herêma Kurdistanê 14 parîyen Herêmê yên Kurd, Turkmen û asûri girtina DTP'ê şermezar kir

Li Herêma Kurdistanê Federal, 14 partîn Herêmê yên Kurd, Turkmen û asûri li diji girtina DTP'ê renazibûnên xwe anin ziman û girtina DTP'ê şermezar kirin.

Yekitiya İslamiya Kurdistanê girtina DTP'ê şermezar kir

Endamê Politbüroye Yekitiya İslamiya Kurdistanê Ebubekir Karwanî, biryara girtan DTP'ê yê Dodgeha Makezagona Tirkîyeyê şermezar kir û girtina parti dê rewşê hêj aloztir bike. Ebubekir Karwanî derbarê mijarê de agahi da û got, "Em gavêni bi vê awaye û biryaren wiha nerazi ne. Me berê ji daxuyaniyek dabû ku em pêvajoya vebûnê yê Tirkîyeyê destek dikin." Karwanî wiha domand: Karwanî got, "Em wek Yekitiya İslamiya Kurdistanê vê biryare şermezar dikin."

PSK-ê girtina DTP-ê şermezar kir

Partiya Sosyalista Kurdistan-PSKê, bi mebesta şermezkirina biryara girtina Partiya Civaka Demokratik-DTP'ê ya ji aliye Dodgeha Destûra Bingehin ya Komara Tirk ve, daxuyaniyek niviski belav kir. PSK, di daxuyaniyâ xwe de bang li ali û hêzên ku demokrasi û guhertinê dixwazin, dike ku li hember vê biryare dengê xwe bilind bikin. Daxuyaniyâ Partiya Sosyalista Kurdistanê weha ye;

Divê Hikumeta AKP'ê bi wêrekî û bi biryari pêvajoya 'réliberveybûn' ê bidomine, xwe ji tevger

û helwesten ku li gor berjewendiyê dijberen 'réliberveybûn' ê bin, dûr bixe, dest bi xebata amadekirina Destûreke nû ku li gor pirçandiya Tirkîyeyê be, bike. Partiya me biryara Dodgeha Destûra Bingehin ya girtina DTP'ê şermezar dike û bang li ali û hêzên ku demokrasi û guhertinê dixwazin, dike ku li hember vê biryare dengê xwe bilind bikin.

Sekreterê parlamento ya Kurdistanê Ferset Ehmed:

"DTP li diji şidet û terorê bû" Sekreterê parlamento ya Kurdistanê Ferset Ehmed li ser girtina DTP'ê nérina xwe ani ziman. Ferset Ehmed di daxuyaniyek de ji malpera Dengûbasê re nérina xwe li ser girtina Partiya Civaka Demokratik (DTP) ani ziman û ragihand, biryara girtina DTP'ê ji aliye dadgeha destûri ya Tirkîyê ve, di cihê xwe de nebû û wiha got: "Bêguman dê bandoreke xerab li ser rewş û gavêni aştiyê li Tirkîyê çê bike."

KOMKAR-EU: "Girtina DTP'ê xizmeta demokrasi û aştiyê nake"

Serokê Giştî yê Konfederasyona Komeleyên Kurdistan li Ewrûpa-KOMKAR-EU Kovan Amedi, bi mebesta şermezkirin girtina DTP'ê daxuyaniyek belav kir.

Bayram Boznel: Bi girtina DTP'ê derbe li demokrasiyê hatiye dayin

Serokê Giştî yê Partiya Maf û Azadiyan-Hak-Parê Bayram Boznel, derbarê girtina DTP'ê de daxuyaniyek belav kir. Boznel, di daxuyaniyâ xwe de diyar dike ku bi girtina Partiya Civaka Demokratik-DTP'ê ya ji aliye Dodgeha Destûra Bingehin ve, derbe li demokrasiyê, pêvajoya 'réliberveykirene' û hewldanen çareserkirina pirsgerêka kurd ya bi şewyeke demokratik û aştiyane hatiye dayin."

YPK-ê ji girtina DTP-ê şermezar kir

Yekitiya Parlamenteleren Kurdistanê derbarê girtina Partiya Civaka Demokratik de ragihandinek belav kir û té de biryara dadgeha destûri ya Tirkîyeyê şermezar kir. Di ragihandinê de té gotin: "Ya ku li beravajîya xwebin û pêşhat û eger û daxwazan bû, derçûna biryara dadgeha destûri ya Tirkîyeyê bû ku kulmeke dijwar li gavêni hikûmeta Tirkîyeyê yên ji bo çareserkirina arişeya kurdî li Tirkîyeyê da.

Girtina DTP'ê wê çendê diselmine ku li diji iradeya gelê me yê li bakûr dijberîyeke bîhêz di holê de ye û ji bo raya giştî ya hundir üderveyî Tirkîyeyê rûdaneke çaverenekirî bû. Di rastiyê de ji li şûna pêşvebirina demokrasi û istiqrara aştiyê, ji nû ve tetbiqkirina nerita şovenista dehan sal berê ye.

Yekitiya Nivîskarên Kurd-Duhokê girtina DTP-ê şermezar kir

Yekitiya Nivîskarên Kurd - Duhokê bi beyanameyekê girtina Partiya Civaka Demokratik şermezar kir û got: "Em vê siyaseta fermî a şas reswa û şermîzîr dikin, daxwaza rézgiritinê li azadi û serbestiya tevaya gelên Turkiyê dikin."

Li Kurdistanê Federal rojev girtina DTP ye

Nerazibûnên hemberi girtina DTP li başûrê Kurdistanê dewam dikin. Seat 14:00'ê paşnîvroya iro li Baxa Giştî ya Silêmanîyê zêdetir ji 2000 welatiyên kurdistanî li jîr baranê di çarçoveyeke neteweyî de ji bo şermerkirina girtina DTP'ê xwepêsandanekê saz kirin. Hêjmareke zêde rewşenbir, nûnerên partîyen siyasi, nivîskar, rojnamevan û çalakvanên sivil û parlamenteur besdarî xwepêsandanê bûn. Xwepêsandanî bi peyama helbestvanê mein Şerko Bêkes hate destpêkirin, herweha parlamenteur Kurdistanê Dr. Refîq Sabîr, Mihemed Emin Pêncîwêni ji gotarêni xwe pêşkeş kirin.

Sozan Xale Şîhab: Divê endamên parlamento ya Kurdistanê dikin, ku hemû di bareya pîrsa qedexekirina DTP de xwedî yek hilwest bin Seroka lista kurdistanî di parliyamenta herêma kurdistanê de Sozan XaleŞîhab da nişandan, ku ew daxwazê ji endamên parliyamenta herêma kurdistanê dikin, ku hemû di bareya pîrsa qedexekirina DTP de xwedî yek hilwest bin.

Sozan XaleŞîhab got: herçende ku qedexekirina DTP pîseka navxweyiya Turkiyê ye, belê herêma kurdistanê ji bi tîrs e, ku pikolên aştiyê li Turkiyê bi ser nekevin...

Me wek lista kurdistanî daxwaz ji serokatiya parliyamentê kiriye, ku sibehê rûniştinekê di evê bareye de saz bike û tê de hilwesten hemû parliyamentaran bi hilwestê serokatiya herêmê û hukûmeta herêmê re bibin yek.

Parlementerên DTP'ê biryar dan ku bi BDP li parlementoyê bimînin

Hevserokê DTP'ê ya hate girtin Ahmet Turk û qedexeya siyasi ye, diyar kir ku piştî nerin û daxwazên gel, saziyên sivil girtin û Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan nirxandin, biryara ku ji parlementoyê istifa nekin û di Partiya Aşti û Demokrasiyê de tékoşina xwe bidominin stendine.

Turk, destnisan kir ku biryara girtina DTP'ê siyasi û dijhiqûqi ye û wiha got: "Ev biryara feraseta inkar, imha û asimilasyone ye. Ev ne biryarek hiqûqi ye. Partîyen HEP, DEP, OZDEF, HADEF, DEHAP û DEP di encama vê ferasetê de hatin girtin. Lî disa van astengîyan bawariya me ya aşti, demokrasi û azadiya têk nebir. Me her tim biryara mezinkirina demokrasiyê sten. Li gel 6 partîyen me hatin girtin em disa aşti û demokrasiyê esas digrin."

Turk wiha dom kir: "Lî belê ji ber ku em giringiyê didin aşti û demokrasiyê em di vê daxwaz û biryara xwe de israr dikin. Divê beri her tiştî em Partiya Aşti û Demokrasiyê (BDP), bi hêz bikin. Em wê biginîn asta ku bibe bersivê hemû kesan. Bibe wicdanê gelê kurd, tirk û Tirkîyê. Kesén demokrasiyê esas digre û giringiyê didin demokrasiyê divê li dora BDP'ê kom bibin û hêzê bidin vê partiyê. Divê BDP berpirsiyariya demokratikbûna Tirkîyeyê bide ser mile xwe. Ji bo me tékoşina demokrasiyê esas e. Turk wiha dom kir: "Windakirina caneki ji girtiya partiyekê giringtir e. Ji bo ku em qet naxwazin mirov bene kuştin, em bang li hemû kesi û partiyan dikin em dibêjni werin em édi bes canan winda bikin, werin em ré li pêsiya kuştin û windakirinan bigrin. Em dibêjin werin em bi hevre tékoşina aşti û demokrasiyê bim."

Uras besdarî BDP'ê dibe

Parlementerê Serbixwe yê Stenbolê Ufuk Uras ku biryara mayina li Meclîsê ya DTP'ê nirxand, diyar kir ku ji bo avakirina komê weki beri niha goti dê besdarî BDP'ê bibe.

Ocalan: Divê DTP'ê di Parlamentooyê de bimînin

Abdullah Ocalan Li gorî nûçeyâ ku di ANF de cih girtiye, Ocalan per bi parêzêren xwe re hevditina hefteyî pêkanî û derbarê vekesina DTP'yan ji parlamentooyê ku tê niqaşkirin de axivi. Ocalan got, çareseri tékoşina demokratik e.

Wê ji vir şûnde ci be?

DDTP ji aliyê dewleta Tirk ve hate girtin... Beriya 7 partiyên din ên tevgereya siyasi ya bakûrê Kurdistanê jî hatibûn girtin. Li kolanan alozî mezin dibe, dewleta tirk êrîşen xwe zêdetir dike. Wê ji vir şûnde ci be?

Serhad B.RENAS

Dî rastî dê zêditr tişt nebin û neguherin... Ji bo Kurdish pêşketinê wisa ne supriz in. Tîsteki ku bibe sedema bêhîvitye ji nine. Rewş her tim alov bû xeter pir bûn. Kevir di cihen xwe de nedisekinin. Edî kevirén mezin cih diguherin û bégúman hêjinén vê yekê ji hebin. Aliyeki dewleta Tirk ne zêde "dilxwaz" be ji di wê genaatê de ne ku edî inkara 90 salan bêencam e. Bi relivekirin (açılım) felan bêvan dixwazin hin tiştan bikan. Lî tiştén li gori xwe... Ne li gor rastiya Kurd û Kurdistanê. Li aliyeki din gelê tirk zêdetirê 90 salin tén xapandin. Edî gelê Tirk derewên sistema ku ser inkara netweya Kurd avakirin bawer kiriye.

Niha bi eşkereyi xeletiyen xwe ji qebûl nakin. Nikarin vê yekê ji gelê xwe re ji rave (izah) bikin. Lî çareke din a wan ji nemaye. Têkoşina rizgariya neteweyi a bîhêz û bibandor ya Kurdish, rewş û rastiyan cihanê ku bi temami hatine guhertin, bandorén serdema ragihandinê û hewla dayina peyama "dewleta Tirk bi hêz e, paşve gav navêje..." Faktorén han û faktorén zêdetir sistema kurm keti û pûc büyi ya dewleta Tirk xistiye tengasiyeke mezin. Ev wek listika kişikê ye. Her ali hemleya xwe dike. Bi avayeki xwezayı PKK hewl dide ku wek mixetap di nava pêvajoye de cih bigre. Bi rastî û cewtiyen xwe tevgere PKK aktora sereke ya pêvajoya 30 salen dawi ye.

Li şûna PKK kijan rexistin û hêz bûya wê bixwastka ku tiştê ku bixwe anije rojêvi di encama wê de ji xwedî gotin be. Di jiyanê tu rexistin an ji hêz an ji şexs di meseleyeke wisa de bivê nevê nikare cûdatir tevbigere. Her ali li gor xwe hêza û bandora xwe nişan dide. Di vê pêvajoye de rola heri xirab hêzên Kurd ên dervey PKK listine. Li gor wan hêzan heta niha ré li ber wan girti bû ji bo xabetê. Lî cawa dibe ku ji bo axaftinê li ber wan asteng tune ye lê bo xebatê heye? Ewqas hêz û grup nekarin heta niha organike medyyayê a pêşketi, modern û profesyneli ji Kurdish re ava bikin li gori min mafê axaftina aliyen ku heta niha bêdeng sekinine ji vir şûnde tune ye.

Di pêşketinê dawi de bêgûman gellek faktor û sedemén "veşarti" ji hene. Pazaryen veşarti û listikên paş perdeyê... Girtina DTP ji hemleyeke dewleta Tirk bû. Gaveke çavtirsandinê bû. Ü ji bo gelê Tirk mesaja "hûn meraq nekin en liser karin" bû... Girtina DTP dibe ku "hin alian" bextewar kiribe. Ji bo Kurdish zireke mezin tune ye. Tenê rûye rastî ya dewleta Tirk careke din derketiyê holê. Jixwe partiya nû a bi navê BDP amade ye. Partiyen din ên Kurdish ji wek HAK-PAR hene.

Disa derket holê ku Tirk aştiyê naxwazin û tehemmüli Kurdish nakin, edî bi hev re mayina Kurd û Tirkan ne mimkune, ewlehiya Kurdish di navistema dewleta Tirk bi temamî qediye û divê Kurd bigêhîn statuyeke otonom. Divê Kurd hêzên xwe begüherin rêvebirîye xweser. Medaya Kurdish, dezgeh, komale-sazi, mekanizmayen hilberinê çandi û rexistinê diasporaya Kurdish, şaredariyê Kurdish li ser piyane û di karêm xwe de berdewamin. Nexşeriya Kurdish heye. Riya Kurdish riya azadiya Kurdistan û pêşketin e. Têkoşina Kurdish ne têkoşina hebûneye, têkoşina avakirina netweyeke bi hêz û pêşketiye. Kurd dimeşin, Kurd li riya xwe ne...

serhadrenas@yahoo.com

Di êrişa Kopê da jî tiliya dewletê heye

Zinarê XAMO

Êrişkarê Kopa qeza Mûşê, Tûran Bilgen ji weke êrişkarên bûyera Stenbolê, merivê dewletê derket. Hat ragihandin ku Tûran Bilgenê ku do li Kopa qeza Mûşê bi kelaşinkofê meşvanen ku girtina DTP-ê protesto dikirin gulebaran kiribû û di vê êriş da du kes kuştibûn û 8 kes ji birindar kiribûn hatiye girtin. Na wele bira ne hata girtin ji... Mérîk li orta bajêr, li ber çavaen bi hezaran kesi bi kelansinkofê girse gulebaran kiriye, ma bira neyê girtin ji? Tê gotin ku éreşkar merivê JITEM-ê ye û kelansinkof ji dewletê daye wi. Pûlis li dikana Bilgen, elege pola, bombeyen gazê û maske ji ditiye. Yanî mérîk weke elemaneki JITEM-ê tam bi techizat bûye. Bi ihtimaleke mezin weke bûyera Dolapdereya Stenbolê, tiliya "dewleta kûr" û hêzên faşist ewê di vê êriş da ji hebe. Yanî weke serokwezir û çapemeniya tirk do gotin, ev ne "reaksiyonâ esnafekî" ye, mérîk merivê dewletê ye û bi kelansinkof e. Di destpêkê da ji bo êrişkarên Stenbolê ji eyni propagande kirin, gotin "milet e, xelkê taxê" ne, lê dûra derket ku derew e, êrişkar bi peran kirê kirine. Ji xwe ji êrişkarên qereci yekî gotiye, 500 lire dan min û gotin here bera wan de û min ji cû bera wan da. Camêr gotiye ew li dû nanê xwe ye, ki pera bide wî, ewê daxwaza wî bici bine û kêt bixwaze ewê here jê ra birevine. A dewlet tirk li her derê li hember kurdan insanen wiha bi peran kirê dike û bikar tîne. Ü dûra ji dibêje milet aciziya xwe nişan da. Weke min di nivisa xwe ya wê rojê da ji gotibû, êrişen wiha bêyi organize û kontrola dewletê ne mimkûn e, dewlet di bin ra bi piranîji qereci, sûtal û pêxwasen kuçan organize dike û dişine ser kurdan.

Êrişka Kopê ji miheqeq wisa ye. Berê tiştê wiha dernediket, veşarti dime. Lî nuha ya baş ew e ku provakadyonê wiha zû derdikevin, xelk dibine ku tiliya dewletê di van êrişan da heye. Li ali din, şiwitandina mal, dikan û wasiteyên xelkê ji ne rast e û dibê meriv li dijî derkve. Meş û çalakiyên demokratik dibê werin kirin, dibê kurd nerazibûna xwe ya li hember siaysetê hukûmetê nişan bidin. Ev mafekî demokratik e, lê bikaranina şidetê, şîweitandina dikan û wasiteyên xelkê suwil ne tu haweye û şas e, dibê PKK ji van bûyeran qebûl neke. Lî tiştê heta nuha xuyaye PKK, li diji van bûyeran dernakeve û ji kitleya xwe ra nabêje wiha nekin. Ev ji tê wê manê ku PKK ji van bûyeran taswîb dike. Bi baweriya min ev tişteki şas e û dibê PKK bûyeren wiah taswîb neke. Ji bo sarbuna xelkê, dewlet ji dikane bûyeren wiha bike, zirarê bide malê insanen û bîbêje kurd in. Ma heta nuha dewletê li ser navê PKK-ê hindik çalaki kirine û insan kuştine û dûra ji xistiye hustuyê PKK-ê. Çawa ku em li diji şideta hêzên faşist û dewletê ne, dibê em bixwe ji eyni şidetê li hember mixalif û xelkên sivil bikar neyin. Heger eme ji eyni tiştî bikin, wê demê devê em ji şideta hêzên nijadperest û faşist ji gazinan nekin...

Aşitîya me erzan e, a we bi ci ye gelo?

Fahri Karakoyunlu

Aşitî demeke dirêj e di devê me Kurdish de wek benîşte kerengê tê cûyin. Em bi aşitîyê radibin, bi aşitîyê radikevin. Bi aşitîyê dixwin bi aşitîyê vedixwin. Bi aşitîyê şadibin, bi aşitîyê dilizin. Bi aşitîyê zaroka dîkin xew, bi aşitîyê radikin ji xew. Bi aşitîyê dişinin kolanan, bi aşitîyê dişinin dibistan. Bi aşitîyê dişinin hola listokan, bi aşitîyê dişinin çalekiyan. Bi aşitîyê peyvîn xwe dixemlinin, bi aşitîyê xwe dipesin. Gelo Kurd bi rastî ev qas gelleki aşitîwaz e. Bi rastî ez nikarim bêjim erê. Gava ku Kurd desthilatdar bû, di nav xwe de û ji bo dendorê xwe bi rastî aşitîwaz bûye? Ger ev ne politika be, bi ya min realite dibêje na. Gelo mirov gava bahsa hinek têgina dîkin, ev têgin di devê mirovan de di devê ciwatan de di devê berdevkê saziyan de cîma wata xwe diguherin e. Cîma her kes dixwaze li gor fîr, raman û daxwazén xwe vê peyvî bi nav bi ke û wateyekê lê bar bi ke. Aşitî, bi rastî peyvek bi wate ye. Peyvek piroz e. Peyvek gîranbûha ye. Lî...

Gellek caran bi karanina vê peyva piroz, wateya ku kes lê bar di ke gelê wek hev e? Na . Wateya aşitîyê, di pratîka jiyanê de dema pirsgirêk di mabeyna kesan de an civatan de çê di be tê holê. Weki din aşitî wek têgihinek felsefi, etiki ye. Ev wateya ku alîyan pirsgirêkan li aşitîyê bardikin cîma ne wek hev in? Gellek cari, di mabeyna kesan an civatên layan de wek hev né fêmkirina vê ji desthilatdariyê û ji derûniya serdestiyê tê. Gava ku diroka mirovahîyê tê nirxandin, di devê desthilatdar de pêşkêkirina peyva aşitîyê, testlimiyet an tune bûn e... Gava kesek, civatek serdest be an desthilatdar be, ji bo wana aşitî û aramî qebûkirina desthilatdariya wan an ji jiyanek ku çerçova wî, wana xézkirî be. Diyarkirina ne razibûna vê rewşa bê rûmet, divê hebûna hêzên gel û berwîdanak bi rûmet destpêbîke. Gava ku ev tune be, di devê desthilatdar de wata aşitîyê, teslimiyet an tune bûn e. Em gava di devê kes an civatên bin dest de aşitîyê dinirxîn, ji bo wan aşitî, her car wek hevi, birati û aramî ye. Ev derûniya kes an civatên bindest, an ji ne bi hêz, gelô bi rastî ji aşitîwazbûna wan ciwata an ji, ji bê hézbûna wan tê? Bi ya min, ev gotar gellek cara di devê van civatan de derûniya bê hézbûnê, bê çaretiyê ifade di ke. Kes an civatek bi hêz ku kari be, gellek tiştan bi ke û nek e, ji bo mirovahîyê û ji bo wekheviyê aşitîyê bi dev ke, wê demê di devê desthilatdar de wata aşitîyê cîhe xwe dibine. Gellek cari aşitî li pé şerekî tê.

Gava şerek di navbeyna keski an civatek de dest pé dike, desthilatdariya wê civatê, ji bo ku civat an gelleki din û hiqûqa wê tune bi ke şer derdixe, li hemper vê êrişâ ne hiqûqi ji, civata bin dest vê êrişê qebûl na ke û gor hêzên xwe berxwedide. Ev wek tiştiki du ali ye. Gava desthilatdar an yên xwe desthilatdar dibinin, êrişê ne bin ser û hiqûqa wan civatan bipnê nekin, ew civatana wê dinav xwe de sazûmaniye wekhevi dé rastkin. Gava ku xwe serdest bibine û bi wê civatê re, nexwaze wek hev bijin, wê dest bi zilmê bi ke û wê şer di navbeyna wan de derkeve. Ta ku herd û ali têbigihîjîn ku, şerî di navbera xwe de bê wate bibinin û şer rawestinîn û ji bo li hevhatinê di nav hewildanakê ke ve. Berê na, lê ji şerî du yemin yê cihanê vir de, ne seranserî dinê be ji, ji bo destpêkirina dînyake aşitîyane hewldan çebûn û sazûmaniye navnetewi, bi destê yekitiya milleti ava bûn. Bi damezirandina van sazûmaniyan ve ji, di dema pêvajoya şerî sar de gellek şer û pevçün di navbeyna dewlet û gellan de derket, gellek ne hiqûqi û tadeyi bi ser hinek milletan de hat. Gellek caran ne bi dilen alîyan be ji gellek pirsgirêkên navnetewi an çareser bûn an ji kete riya çareseriyê. Ji rawestandina şer sar û rûxandina sistema Sovyet şûn de, ji bo çareserkirina pirsên navnetewi hewldanen saziyên navnetewi zêde bû ye. Hinek mekanizmîn iroin yê saziyên nevnetewi li himper gellek şer û pevçûna digrin. Hinek pirsgirêkên dirokî dikeve riya çareserkirinê.

Gelo şerî Kurda û Tirka ci ye? Dê çareserî û aşitî çawa wer e?

Mesela Kurda mesela Kurdistanê ye. Her çiqas wek reel politika, ev daxwaz ci bi cî nê holê û dê niyse nû vê meselê çawa binirxin e û téke riya çareseriyê ji, lê do ji, iro ji û di ayende da ji, ev mesela, mesela milleti ye û welati ye. Ji ber wi, mesela Kurd ne yek ali bi Tirkan re- di çareserkirina meselê de aliye heri serek Tirka û politika wan e- bi hinek alyê din re ji ger çareser be. Ev pêvajoya her çiqas di nav xwe de gellek proplema di hewine ji, li başûre Kurdistanê ketiye rîçek çareseriyê. Bi ya min, têkiliya Tirka û Kurda tu cari li ser wek heviyê ne meşîya ye. Ev ditina min gava ku Kurd bi hawaki otomobîn ji wisa bû ye. Dibe ku, di çerçeva imparatoriyê de li ser ziman û kesayetiya milleti, wek dema Komara Tirka asimilasyon û inkarkirin ne xurt bû be, lê mixabin bi destê rîvebirîyê, wek gelleki desthilatdar Tirka, tim serdest bû ye û Kurd ji di bin desthiladdariya wan de ma ye. Ev rastîya ji bo me Kurdish ji û ji bo Tirkan ji tim bi vî şekli û derûniye dom kiri ye.

Navneteweyî

Hikûmeta Yewnanistanê ji ber deynê navxweyî ber bi iflasê ve diçe

ATHENA (Pêşketin)

Hikûmeta Yewnanistanê ji ber deynê navxweyi her diçe ber bi iflasê ve diçe. Çapemenî, xebatkarên cemaweri û doktaran hikûmet hişyar kir. Pişti ku dereceya krediya Yewnanistanê ya ji ber nedayîna deynan daket, hikûmeta Serokwezir Yorgo Papandireu di rojê zor de derbas dibe. Hikûmet ji bo çareseriyê hewl dide budçeyê biçûk bike û tengav li karkeran bişidîne.

Li ser vê xebatkaran berteke nişan da. Ji ber vê tengavkirina şert û mercen xebatê li Yewnanistanê xebatkarên cemaweriye û çapameniyê û doktoran dest bi grevê kir. Grev ji bo hişyariye ye û dê 24 saetan bidome. Rûsyâ û Amerika néziki rôkkeitinekê bûne li ser kontrol kirina çekan Ji ber vê bi sedan xebatkarên çapameniyê civin betal kirin, kanalên cemaweri û taybet, istasyonên radyonan ji weşana agahdariye rawestandin.



Her wiha Komisyonâ YE'ye ji ber ku deynê Yewnasistanê ye 300 milyarı heta meha çile dem da Yewnanistanê. Papandireu roja 4'ê cotmehê hat ser kar û dest bi politikaya tengavkirinê kir û di vê derbarê de bê ku tawizan bide helwesta xwe didomîne.

Li Pakistanê herî kêm 22 militanên Taliban hatin kuştinê

Çavkaniyê nûcan yên Pakistanê ragihandin ku di encama şerê navbera hêzên ewlehiya vî welati û militanên Taliban li navça eşir lê dijine Pakistanê herî kêm 22 militan hatin kuştinê. Kanala nûcan ya JIO ya Pakistanê di vî warî de ragihand ku hêzên Pakistanê bi palpiştiya helekopterên cengê duh li navça Xorem a jêrin êriş birin ser militanên Taliban û di encamê de herî kêm 15 militan ji wan qumandeyeki Taliban yê herêmê kuştin.

Peres û Gul li Kopenhanê hevdîtin kir

Pişti şova Serokwezirê Tirk Recep Tayip Erdogan a Dovosê tekiliyê nav Israîl û Tirkîyê bi pivan dihat kirin. Pişti şova Serokwezirê Tirk Recep Tayip Erdogan a Dovosê tekiliyê nav Israîl û Tirkîyê bi pivan dihat kirin. Lî ev Li Kopenhangê guheri. Duh Serokmarê Tirk Abdulah Gul û Serokmarê Israîlê Şiman Perest hevdîtin kir. Peres û Gul ji bo civina bilind a Guherina Avhewayê çubû paytexta Danimarka Kopenhangê. Hat gotin ku daxwaze hevdîtinê ji Israîlê hatiye. Peres pişti şova Erdogan a Davosê yekemin car e ku bi rayedareke tirk re hevdîtinê dike.

Times: Belgeyên ispata amadekirina bombeya nuklerî ya İranê di destê me de ye

Rojnameya ingilizi times diyar kir ku di destê wan de belgeya veşarti ku nişan dide û ispat dike ku Iran amadekariya bombeya nuklerî dike heye. Li gor nûçeya rojnameyê belge bi xebata 4 salan hatiye bidest xistin. Li gor belgeyê Iran dê di nava 6 mehan de bikaribe bombya nuklerî bidest bixe.

Katalanya got: Serxwebûn

Li gora agahiyan her ji sê katalanan yek beşdarî referandumê bú û ji sedi 95-ê beşdaran ji bo dewletek serbixwe ya katalanî deng da. Herçi tu meşrûyeta vê referandumê nin be ji bo referandumâ sala 2013 de diyardeyek berbiçav tê qebûlkirin.

Li Şiliyê "çep" têk diçe

Li gor encamên tûra yekemîn ahilbijartînên serok dewletê ya li Şiliyê rastgir Sebastian Pinera li pêsiye. Li Şiliye di 15 salê dawi cara pêsi çepgir têkdiçin.

Encama êrişa Erebistanê li dij bakura Yemenê, 70 sivil hatine kuştin

Di encama êrişa esmaniye Erebistana Seûdi li dij gundekî li ser sinorê Yemen û Erebistanê, 70 sivil hatine kuştin.

Îsal kuştina rojnamegeran pir zêde ye!

Komiteya Parastina Rojnamegeran ku navenda wê li New Yorkê ye diyar kir ku di nav vê salê (2009) de 68 rojnameger dema peywira xwe pêk dianin li ser kar hatin kuştin. Ev jî rîjeyeke rekor e. Rêxistinê hê biryar nedaye ka 20 rojnamegeren din ên ku hatine kuştin li ser peywirê an ne li ser peywirê hatine kuştin.

NEW YORK - Komiteya Parastina Rojnamegeran ku navenda wê li New Yorkê ye diyar kir ku di nav vê salê (2009) de 68 rojnameger dema peywira xwe pêk dianin li ser kar hatin kuştin. Ev jî rîjeyeke rekor e. Rêxistinê hê biryar nedaye ka 20 rojnamegeren din ên ku hatine kuştin li ser peywirê an ne li ser peywirê hatine kuştin.

Di nirxandina dawîya salê ya Komiteya Parastina Rojnamegeran de diyar kir ku par 42 û pérar ji 67 rojnameger li ser peywirê hatibûn kuştin. Komite zêdebûna hejmara îsal bi kuştina 13 rojnamegeren Filipinan ve girêdide. Komiteyê diyar kir ku kuştina pirtirê rojnamegeren Filipinan siyasi ye û hikûmet ji bi ser de naçe.

Xwestin dizekê bi saxî bişewitînin

Li Guatemalayê jinek bi idîaya diziye li ber çavêن sedan kesî hate lînçkirin. Guatemalayê jinek bi idîaya e diziye ji aliyê bi sedan kesî hate lînçkirin. Linçkeran pêşiyê jinik tazi kir, wê lînç kir û paşê xaz li laşê wê kir û xwest wê bi saxî bişewitînin. Beriya agir berdin laşê wê jinik hate rizgarkirin.



HAWAR NET
kurdistan
zanyarî zaxo amed duhok
mîrdîn batman hewlîr sine agîrî xaneqîn
cîzîr erxenî erîn wan colêmerg erdiş bedîs
sört şîrmex mehebad riha quinjlo kermansan
sîlêmanî nûçe idrîr kerkük
givîn givîn
stanbul berlîn paris makkâ tehran
aktuel brusel zanist bûyer teknoloji
çand rojev zîman huner
zanîn xwe nasîn e...
HAWAR NET
hawarnet.com

Di konferansa Kopenhanê de lihevhatieneke lawaz

Di konferansa NY ya li Kopenhagê de peymaneke derket holê lê naverok gellek zeyîf e.

KOPENHAG (Pêşketin)

Ji civina bilind a avhewayê ya Neteweyén Yekbûyi ku li paytexta Danimarkayê Kopenhagê, di 7ê kanûnê de dest pê kiribû, serokên welatan ên beşdarê civinê bûbûn li ser peymaneke lawaz ku armancêñ hejmârî té de ninin, li hev kirin. Hat diyarkirin ku armancêñ hejmârî yên kêmkirina berdانا gaza serayê dî de meha çile de bêne diyarkirin. Li gor encamên civina li Kopenhagê ú xetereyên ku cihan pê re rû bi rû ne dikare bê gotin ku civin têk çûye. Rayedareki amerikî ragihand ku pişti hevditineke pirali ya navbera Serokê DYA' yê Barack Obama, Serokwezirê Çinê Wen Jiabao, Serokwezirê Hindistanê Manmohan Singh ú Serokdewletê Efriyâ Başûr Jacob Zuma de, li ser peymanê li hev kirine.

Rûsyâ amadeye beşdariyê di peymana kêmkirina encamdana gazên xerab de bike. Serokê Rûsyâ yê D. Mêdvêdêv di civina serok û berpirsên hikmeten welatên beşdar di konferansa N Yî de, ya derbarê rewşa kilimayê li Kopéhaginê derbas dibe ragihand, ku Rûsyâ amadeye tevi peymanek giştî bibe sebaret bi kêmkirina encamdana gazên xerab. Bi gotinê Mêdvêdêv Rûsyâ pilandike hetani sala 2020 bi 30 selefi encamdana gazên xerab kêm bike. Dr. Zêbarî digel şandeyên beşdarî Kongreya Av ú Hewayê bûbûn encamên kongreyê gotübêj kir.

Di çarçoveya Kongreya Av ú Hewayê ya Cihani de ku li Kopenhag'ê bi rê ve çû, koordinatorê hikûmeta herêma Kurdistanê yê karûbarê Neteweyén Yekbûyi ú ajansén navdewleti Dr. Dindar Zêbarî ku bi serokatiya wî, şandeyâ herêma Kurdistan û Iraqê jî beşdari kongreyê bûn, digel hejmarek ji rayedarên welatên beşdari kongreyê bûbûn, encamên dawiyê yên kongreyê gotübêj kir. Di hevditinê Dr. Dindar Zêbarî yên digel rayedarên welatên ku beşdari kongreyê bûbûn de rêketinê li ser rewşa hewayê ya cihanê ú daxistina pleya germê hatine imzakirin, hatin gotübêjkirin.



Civina pêşîlégirtina germbûnê

Di civina demsalan ku ji aliye Neteweyén Yekbûyi ve li Danirmarka hate li dar xistin şerê di navbera welatên pêşketi ú yên li ber pêşketinê mora xwe xist. Di konferansê bloga welatên ku pêşdi Kevin ku pêşengiya wan welatân Çin û Hindistanê li diji helwesta welatên pêşketi derketin.

Gerbmbûna giloveri

Tê diyar kirin di sedsala 21' em de %70 kêm kirina ku gazén ku dibin sedema bandora serayê pêk tine ú helina qesayyan parsenga demsalan ú germahiyê xera dibe. Ev xera bûn dibe sedema zêdebûna germahiyân. Çend sal berê pisporan wisa texmin dikirin ku derketina encamên xeter ya germbûna giloveri hîn di demen bê de pêk were.

Tê diyar kirin di sedsala 21' em de %70 kêm kirina ku gazén ku dibin sedema bandora serayê ku germbûna giloveri zêde dike dikare qesayên li qutban rizgar bike ú rê li encamên xirab ên germbûna cihanê bigre. Di lékolinek de tê diyar kirin ku bi taybeti kêm kirina asta karbondioksîte pirr giring e.

Hevkariya Sûriye û Fransayê

Wezîrê Aboriyê yê Fransayê Chrîstîne Lagarde di serdana xwe ya paytexta Sûriye Şamê de ragihand ku wan di serî de projeya metroyê û ligel gelek peymanê aboriyê di navbera her du welatan de mohr kirine.

Wezîrê Aboriyê yê Fransayê Christine Lagarde di serdana xwe ya paytexta Sûriye Şamê de ragihand ku wan di serî de projeya metroyê û ligel gelek peymanê aboriyê di navbera her du welatan de mohr kirine. Wezîrê Aboriyê Christine Lagarde roja pêncsemê hevditin bi Alikarê Wezîrê Aboriyê yê Sûriyeyê Abdullah Dardarı re kir.

Di daxuyaniya çapemeniyê de mebesta vê serdanê hate gotin ku ev serdan ji bo pêşdebirina tekiliyên di navbera Sûriye û Fransa de ye. Di vê der barê de Christine Lagarde got ku wan demeke direj bi Sûriyeyê re tekili danenîne û ji bo vê cewêziya vê derxin lez bidin hevkariyê.

Meksîqayê ceset êdî li ber rîyan e



Rayedareñ Meksîqayê, li Bakûrê welat, nêzî sînorê DYE yê, 7 cesedêñ ciwana ewilê hati işkencekirî û piştra hati golekirin li ber rê hate dîtin...

MEXICO CITY (Pêşketin)

Li Meksîqayê şerê navbena kartelan ên dixwanzin kaçaxiya eroînê li destxwe bixe de êdi ceset zêdetir dice. Rayedareñ Meksîqayê, li Bakûrê welat, nêz sînorê DYE yê, 7 cesedêñ ciwana ewilê

hati işkencekirî û piştra hati golekirin li ber rê hate dîtin. Hatê diyarkirin kû wî şeride gelek polis ji hatiye kuştin. Ji 2006 dema dema Felipe Calderon buyî wezir heta niha li wî şeride nêzî 14 hezar kesan jiyana xwe dest daye

Serokê mafya meksîkî Leyva hat kuştin

Serokê mafya meksîkî Arturo Beltran leyva di operasyonek eskerî de hat kuştin..

Yek ji mezintirin serokê mafyayê, serokê mafya meksîkî ku bi kuştina 14 hezar kesi dihate tawanbarkirin, roja bohiri di operasyonek eskerî de hate kuştin.

Li gora agahiyan 50 hezar esker tevi operasyona hemberî mafyayê bû ne û pêvûna dora serok mafyayê du saetan ajotiyê.

Almanya qanûnên xwe jî nas nake

Derket holê ku heri zêde Tirkîye ji Almanyayê çekan dikire.

Derket holê ku heri zêde Tirkîye ji Almanyayê çekan dikire. Li ser mijarê Enstituya Lékolina Aştiya Navneteweyî ku navenda wê li Stockholmê ye (SIPRI) li ser lêcûnên leşkeri yên cihanê lékolinek kir. Derket holê ku di nav 10 salên dawi de lêcûnên leşkeri ji sedi 45 zêde bûne. Li gori vê lêcûn salê 1 trilyon ewro ye. Almanya di reça çekfiroşıya cihanê de 3'yemin e û heri zêde Tirkîye jê çekan dikire.

Di rapora SIPRI'ye de tê aşkerakirin ku Dewletên Yekbûyi yê Amerikayê (DYA) bi ferqeke pir mezin yekemin e û wi Rûsyâ dişopine. Li réza 3'yemin jî Almanya heye. Almanya par bi 5,7 milyar ewroyi çek firot. Rapor ji aliye dêr û enstituyên aştiyê ve hevpar hatiye amadekirin. Di rapora mijara gotinê de zêdebûna trenda çekfiroşıya Almanya yê balê dikêse.

Ji bo reklam dayînê agahi@hk-mg.net

Zanist û Teknolojî

2010'an wan tiştên nû ku dê jiyan me rehettir bike

12 nûvedanê ku di 2010'an dê bikeve jiyana mirovan ewin

AMED (Pêşketin)

Scooter hibrît

Peugeot HYmotion 3 ku seyareyeke bo nava bajaran e di gel motora 125 cc'yi li tekerên pêş 2 motorên bi elektrik ji daniye.

Di nav bajér de kirê kirina erebe

Saredariya parisê bi sistema bi navê Autolib ku 2010'an de bikeve xizmetê di bi riya abonetiye herkes kariba di nava bajér di istasyonên nişan kiri de erbeyeke kirê bike û pişti ku cü cihê xwe erbeyê deyne istasyona li wê derê.

E-rojname

Pişti pirtûka elektronî ya Amazonê Kindle gihêst serkeftineke mezin niha versiyoneke nû ku dikare bi riya internetê dosyayê bi formata PDF daxine derket bazarê.

Projektorâ bi qasê destan

Mpro 120, bi qasê destê ye û pir sivik e. Bi saya wê dikarin li her derê pêşkeşiyênen xwe nişan bidin, film temâse bikin.

Dilê çekirî

Nexwexaneyâ Georges-Pompidou ser dilêki çekirî dixebeite.

Otomobila ku bi hidrojenê dixebeite

Ev seyareya Honda tenê bi sûtemeniya Hidrojenê dixwebite.

Bo xirabiya lêdana dil, derman

Şirketa Sanofi dermaneke bi navê Multaq riska mirina ji ber xirabiyênen ritma dilê ji % 45 kêm dike çekir.



Telefona ku bi enerjiya rojê bixwebite

Telefona bi navê PCM dikare bi panelen xwe yên sonar ên paş telefonê bixwe şarj bike.

Otomobila ku bi elektrikê dixebeite

Renault Fluence ku erbeya malbatî ye bi elektrikê dixebeite.

Goreya jinan ku naqete

Invista, goreyeke tenik a jinan bi navê Lycra Fusion çekir ku naqete.

Robota ku boriyan tamîr dike

Robota han dikare di nava 2 saetan de xirabiyênen di nava boriyênen avê de çê bike.

Otela ezmanê

Şirketa Galactic Suite amadekariyênek yekemin otela li ezmanê da dest pêkirin. Li gor agahiyan ji bo mîvandariya di otelede de ji bo 3 rojan divê bi qasê 4 milyon û 500 hezar dollar were dayin. Lîmana fezayê li eyleta DYE a New Mexicoyê tê ava kîrin.

HAWAR NET.com

Ji her du kesî yek nexweşê gastrîte ye

AMED (Pêşketin): Di madê mirovan de némgirtina mukoza yê ye. Bi piranî di mirovén gihîsti yên temenê wan pêşveçûyi de tê ditin. Disa di hemû besên civakê de tê ditin. Bi piranî gastrîta kronik (muzmîn) tê ditin. Li gor ulserê xesareke banegehi heye.

Lê dema bi pêş ve here, dikare kûr here û derbasî ulserê bibe.

Gastrit, bi piranî di encama enfeksiyonâ bakteriyel de pêk tê. Bi dermanê antibiyotik ên tir tenduristi tê pêkanin. Hay ji xwarin û vexwarina xwe tunebûn, vexwarina alkollê, qata made quâ dibe sedema gastrîte. İşandina cixareyê, sinêra ku li ser made bandora wê heye hişyar dike û avzêya asidê zêde dike. Asida zêde ji dibe sedema gastrîte. A. Welat



Ji bo tedawiya pêncêşêrê gaveke girîng

Li cihanê cara pêşî nexşeya hemû şifreyen genetik ên du pêncêşerê-kanserê hate derxistin

Derkistina nexşeyen genetik ên 2 cureyê kanserê di xebatên bo kanserê dewek ji gavê herî girîng a 10 salên dawî tê ditin.

Hate diyar kirin ku bi saya wan nexşeyen genetik wê zanyar karibin li gor xeletiyen DNA'yê dermanen nû bêne çekirin. Hate diyar kirin ku wan her du cureyên kanserê yên melanom û pêncêşera kezebebê ye.

Mirov beriya 105 hezar sal jî ard çedikirin

Amûrên ard çekirinê ên heri kêm 100 hezar salî ne hatin ditin.. Li gor lêkolinkê ku di kovara "Science" de hatiye weşandin mirov beriya 105 hezar sal ji ard çedikirin.

Di lêkolînê de tê diyar kirin ku amûrên ku ji dexl ard were derxistin hatine ditin. Amûrên han heri kêm 100 hezar salî ne.

Heta niha dihat zanîn ku mirov 12 hezar salin dikarin ardê çebikin.

Kjan welatan wê derbasî 4G bibin?

Li Tirkîye û hin welatan ku hê nû sistema interneta bîhêz a mobil 3G nû derbas bûn hate diyar kirin ku di 2010'an de gelek welatan derbasî 4G dibin.

4G ji léza 3G bi dehan car zútir û delfetên cûuda ji bo ragihandina mobil diafrine. 4G ji léza 3G bi dehan car zútir e.

Welatan ku derbasî 4G bin bi wexta derbasbûna wan wisa ye;

* 2010: Vivacell-MTS (Ermenistan), Telus (Kanada), Bell Canada (Kanada), Finland TeliaSonera (Finland), NTT DoCoMo (Japonya), Emobile (Japonya), Norway TeliaSonera (Norveç), SK Telecom (Koreya başûr), KTF (Koreya başûr), Sweden TeliaSonera (Swêd), TeleNor Sweden (Swêd), Tele2 Sweden (Swêd), CenturyTel (DYE), MetroPCS (DYE) ve Verizon Wireless (DYE).

* 2010 an ji 2011: Rogers Wireless (Kanada), Vodafone Almanya (Elmanya), Cox (DYE) ve Vodacom (Efrikaya başûr).

* 2011: China Mobile (Çin), T-Mobile (Elmanya), Hutchison (Irlanda), Softbank Mobile (Japonya) LG Telecom (Koreya başûr), AT&T Mobility (ADYE), AirCell (DYE).

* 2011 ya da 2012: T Mobile (Avusturya), Mobilkom Austria (Avusturya), Hutchison 3 (Avusturya), Avusturya Orange (Avusturya), China Telecom (Çin), France Orange (Fensa), Telecom NZ (Yeni Zelanda).

* 2012: KDDI (Japonya), Chunghwa Telecom (Taywan) ve MTS (Ozbekistan).

Gelo hûn wan tiştan dizanin?

Ji bo we agahiyêen balkêş...

- Mori (gele) dikare di bin avê de 14 rojan biji.
- Neynûka heri hêdi dirêj dibe a tiliya seri û heri zû dirêj dibe ji tiliya navin e.
- Ger giha(nebat) bi qasê sateke dev ji fotosentes kirinê berdin li cihanê hemû giyanwer wê bimirin.
- Xwarinê li çopên (zibil) ku di welatên pêşketi de dikare 15 carî têri mirovén ku ji ber birçibûnê dimrin bike.
- Mirovok di nava rojekê de nézi 23 hezar car nefesê distinîne.
- Kêçêke(pire) ji guleyeke zûtir baz dide.
- Mirov heman mesafeyê ne bi bazdanê bi meşê biçe zêdetir kalorî xerc dike.
- Hêla çep mêjiyê mirovan zanyariyê hejmari û beşa rastê ji zanyariyê sosyal baştar kom dike. Em wexta xemgin bibin an ji këfxwêş bibin beşa rast a mêtîya xwe bi kar tînin.
- Li Cihanê hejmara mirîşkan ji hejmara mirovan zêdetir e.
- Marek dikare 3 salan raze.
- Li beyaniyan sêvek ji qehweyeke zêdetir dikare xewa we kêm bike.
- Dûpişek di nava qeşayê de bi qasê 3 heftê were qefilandin û piştre qeşa were helandin dûpişek dikare bi avayekî normal jiyana xwe bidomine. Dûpişek dikarin bi qasê saleke bê av û xwarin bijin.

Derya spî 2 salan de tije bûye

Nêzi 5,5 milyon sal berê, ava Okyanûsa Atlasê ji Cebelitarik derbas bûye û ji 2 salan kêmîtir de Derya Spî kiriye. Li gor lêkolînan tije bûna Derya Spî tenê 2 sa ajotîye.

Li gor lêkolîna ku di kovara Nature de hatiye weşandin, Derya Spî demekê de grêdanîya wê û Okyanûsa li hemre nine û Derya Spî derya yek girtibû.

Tê diyar kirin ku beriya niha dihat texmin kirin ku tije bûna Derya Spî nêzi çend hezar salan dewam kiriye.

weşanên nûçe - rojname - tv - kovar - radyo

Hemû linkên ji medyaya Kurdi.

Cihê we yê destpêkê!

Bixwinin - Zindî Temâse û Gûhdarî bikin
medyayakurdi.com



Çand û Hûner

"Ev film dê dîroka sînemayê biguherîne"

AMED (Pêşketin): Filmê nû ya James Cameron Avatar derdikeye pêşberi sinemahezan. James Cameron heri dawi filma Titanikê kişandibû û serkeftineke pir mezin bidest xisti bû. Hin niviskarêni sinemayê idda dîkin ku Camreón bi filma xwe ya nû dê cihana sinemayê serûbin bike. Film di 11 salan de hatiye amadekirin. Film bi budgeya xwe ya 400 milyon dolari filmê heri bûha yê dîroka sinemeyê ye.

Bi efektén xwe yên dibarı gelek tiştên nû bi xwe re tîne. Ji %60ê filmê ji dimenê dijital pêk tê. Zimanê ku di filmê ji aliye Na'viler'an ve tê axaftin ji aliye zimanzzan ve hate çekirin. Avatar di mitolojiya Hindan de tê maneya sûreta Xwedeyê a li cihanê. Film bi iddaya pêkanina "şoreş"ek li sinemayê de dikeve nişandanê. Biryar ya we ye... (HAWAR NET.com / SINEMAKURD.com)



Zimanê ku di filmê ji aliye Na'viler'an ve tê axaftin ji aliye zimanzzan ve hate çekirin



"Veguherîn" a Monica Bellucci û Sophie Marceau

Bi atmosfera xwe cûda ú balkêş û bi listikvanêni xwe yên baş "Don't Look Back" yani Veguherin yek ji filmê heri serkefti ya salêni dawi ye. Derhêner Marina de Van hémanen filmên psikolojik bi avayeki cihêring bikartine.

Listikvanêni sereke listikvanêni navdar ên Fernsi û İtali Monica Bellucci û Sophie Marceau ne. Di filmê de Jeanne ku niviskari dike li dû şopeki wêneyekî diçe Italyayê ú dikeve li pêy jineke û dibine ku vediguhere wêjinê. (HAWAR NET.com / SINEMAKURD.com)

"Zimanê Çiya" li Amedê hat ziman



AMED (Pêşketin): Listika "Zimanê Çiya" ku listikvanêni Şanoya Şaredariya Bajare Mezin a Amedê derxistin ser dikê promiyera wê li dar ket.

Listika ku bi teknika Şanoya Forumê hate listin, temâşevanan diyalogên

ku jê hez nekirin derketin ser dikê ú ew guhartin. Bi vî awayi temâşevanan şikleke din dan listikê. Listika "Zimanê Çiya" ji aliye niviskarê navdar e xwediyê Nobelê Harold Pinter ve hatiye nivisandin. Pinter pişti gera xwe ya li girtigeha Amedê ú girtigehê din ên Tîrkiyeyê ev listik nivisandibû. Listika ku bi zimanê "Monutain Language" hatibû nivisandin û listin heta niha li gelek zimanian hatibû wergerandin. Listik niha bi kurdi ji aliye listikvanêni Şanoya Bajê a Şaredariya Bajare mezin a Amedê ve hate listin. Derhêneriya listikê Luciano Iogné kir ú deriyê ku temâşevan têre ketin hundir.

ji weki geriyê girtigehê hatibû çekirin. Her temâşevanê ku ji deri ket hundir, ji bo ku his bikin ku hatina girtigehê mohra ku li ser Zimanê Çiya nivisi bû li wan dan. Temâşevan bi vê şâswaziye li cihê xwe rûniştin, gardiyanen listikê ji li nav temâşevanan geriyan û atmosfera girtigehê bi wan dan hiskirin. Jokerên listikê Kemal Ulusoy û Güle Ozalp Ulusoy qala teknika Şanoya Forûmê kir ú diyar kirin ku mafê temâşevanan heye ku mudexeleyê listikê bikin. Pişti ku listik bi temamî hate listin vê carê dekor guhartin û xwestin temâşevan ji mudexeleyê listikê bikin. Listika ku 15 deqiqe dom kir, bi mudexeleyen temâşevanan saet û nîv dom kir.

Mîmariya kurdan bû kitêb

WAN (Pêşketin): Hunermend û dirokzan Fehmi Gür ku li Wanê diji, ji 118 çavkaniyan súd wergirt ú ji Mervaniyan heta niha afirandeyên giring, bi demen avakirina wan û mimariya wan derxistin holê ú ew di kitêbek bi na vê "Dema Navin ú Şundetir Mimariya Kurd" komkirin.


Çapkirina kitêb ji hêla Weşanên Hedef Heyv yê Wanê ve hate weşandin ú di warê mimari, dirok û kultura kurdan de çavkaniyek giring e. Niviskar vê kitêbê ji gelek niviskarêni biyani û welati berhevkirin ji gelek kitêbênlêkolin ú ansiklopediyan súd wergirt. Kitêb ji 283 rûpelan pêktê. Di kitêbê de gelêk cihêni ku heta niha di dibistanan de, bo xwendekaran dihate fêrkirin ku ji hêla Osmanîyan ve hatine çekirin, çavkaniyan nişan dide ku,

ji hêla kurdan de hatine çekirin. Dînava wan de gelek mizgeft, medrese, turbe, xan, kervansaray, kêt, pir, hemam, kani, mal û qes hene.. Di 11 rûpelan dawi ya kitêbê de, ji Farqinê heta Helebê, Şamê heta Qahireyê envantera afirandiyên dirokiyên ku ji hêla kurdan ve hatine çekirin té derxistin.

Niviskar, di pêşgotina vê xebata xwe ya giring de navê Seidê Kurdi û Ehmedê Xanî ji bilêv dike ú cih dide van rézan:

“... Wek gotina dawi derbarê mimariya kurdan ez dixwazim vê bêjim. Ez difikrim ku niqaşek vê derbarê de di warê zanistiyê de giring e. Armanca vê kitêbê afirinneyên ku ji Mervaniyan heta niha hatine çekirin envantera wan derxistin bû. Derbarê wan de agahi dayin bû. Di warê tiştên ku hatine tesbitkirin de ez hêvi dikim ku ev cih ú war bêne restore kîrin û ji nifşen pêşerojê re têni hiştin.”

Nazdar ji elbûma xwe bi hêviyê



AMED (Pêşketin): Hunermend Nazdar ku bi xwe ji Cizîra Botanê ye û li Elmanyayê dijit ji bo çapkirina Albuma xwe ya nû çûye başûre Kurdistanê. Nazdar diyar dike ku wê gelek kar li ser stiran û melodiyên di vê albuma xwe de ji aliye muzik, stil û kaliteyê ve kiriye. Hunermend Hesen Şerif ji di vê albumê de stiranekê bi Nazdarê re dibêje. Nazdar hivîdar e ku ev albuma wê derkeft, hezdarê deng, stiran û muzika wê, wê kupi nekin, ji ber ku ew ji wek her hunermendeki gelek bi amadekirin ú çekirina vê albumê westiyaye.

Pêşketin

Versiyona çapkirî ya HAWAR NET.comê / Çapa Dijital

Di 10 salên dawî herî zêde kîjan nûçe hatin xwendin?

10 salên dawî de herî zêde hatiye xwendin û weşandina mijara "Bi hêz bûna Çin e".

Li gor lêkolineke dezgehê şopandina medyayê ya Emerîki Global Languge Monitor mijara nûçeyî ku di 10 salên dawî de herî zêde hatiye xwendin û weşandina mijara "Bi hêz bûna Çin e".

Her wiha dezgehî listeyeke nûçeyîn ku di 10 salên dawî de herî zêde hatiye xwendin amade kir.

Nûçeyîn ku di 10 salên dawî de herî zêde hatiye xwendin ewin;

1- Bilind bûna Çinê

- 2- Serê Iraqê
- 3- Erişen 11 ilonê
- 4- Serê diji terorê
- 5- Mirina Michael Jackson'ê
- 6- Serok bûna Obama'yê
- 7- Kriza Abori
- 8- Bahozâ Katrina
- 9- Dagirkirina Afxanistanê
- 10- Olimpiyatên Pekinê
- 11- Tsunamîya li Asyayê
- 12- Serê diji Taliban'ê
- 13- Mirina II. John Paul'ê
- 14- Osama Bin Laden..



Nasname:
Pêşketin – Versiyona çapkirî ya HAWAR NET.com ê Çapa Dijital
Xwedî û berpirşarê giştî: Serhad B.RENAS
Gêrinê berpirşarê Giştî-Editor: Mihemed ZERAX
Navnîşana webê: www.hawarnet.com
Têkîlî: agahi@hawarnet.com
Pêşketin weşaneke Hawar Kurdistan Media Group e. Dezgehî: www.hkmg.net
Nûçeyîn ku di oazwyê nûçeyî de bi dest nîgana Pêşketin an ji HAWAR NET.com hatiye oazîn alob HAWAR NET.com encaya bi çaykanî nîşan danê dikare bê tîkarankî

Facebooka Kurdî vedibe

Kampanya Koma Facebooka Kurdi bi Ser Ket... Wergera kurdi ya Facebookê ji aliye endaman ve dest pê kir. Zimanê kurdi bi awayê fermî kete listeya zimanana. Rêveberiya Facebookê qebûl kir ku wergera zimanê kurdi bike.



Ne ji bo seksê, ji bo fûtbolê werin

Ji alî fûtbolhezan ve Ukraynayê wekî têgiha welatê seksê dîtin, jinêne Ukraynayî qehirand

Di Sampiyonaya 2012 ya Ewropayê de welatên Polonya û Ukrayna wê ji Kupayê re mîvantiyê bikin.
Ji alî fûtbolhezan ve Ukraynayê wekî têgiha welatê seksê dîtin, jinêne Ukraynayî qehirand.
Jinêne Ukraynayî li peytexte Kievê kom bûn û bi sedema welatê wan bi fûhusê re té binavkirin protesto kirin.


Jinêne Ukraynayî di destê wan de bi pankartên "ne ji bo seksê, ji bo futbolê werin Ukraynayê", "Ukrayna ne biusta goşt e, biusta futbolê ye" vê têgiyê protesto kirin.
Jinêne Ukraynayî pisti protestoyê di navbera xwe de maçê listin.

Di Lîga Ewropayê de maçên Grûban bidawî dîbin

Di Liga Ewropya de maçên Grûban bidawî bûn û hemû 1/16 finalist diyar bûn.
Li gora encamên maçên Grûban, Anderlecht, Ajax, Valenciya, Lille, Hapole Tel Aviv, Hamburg, Fenerbahçe û Twente Enschede ji bo túra 1/16 biserketin.
Niha ev Timêne Grûben xwe de dereca yekê û duymen bidestxitin ú sêyeminên

Grûben Liga sampiyonan bo Kûpaya Liga Ewropayê dê têbikoşin. Li gora encamên masen doh û seva bohiri; As Rom, FC Fulham, Galatasaray, Panatinakos, Werder Bremen, Atletico Bilbao, Lissabon û Herta Berlin di Grûben xwe de bûn timen yekem û duymen û derbasi 1/16 finalê. (Sporkurd)

Li Emerîkeya "kerxane mîran" vedibe



NEVADA- Li Emerîkeye li eyaleta Nevada pişti ku qedexuya ser "fehiş" bûna mîran rebû xwediye kerxaneya bi navê Shady Lady dest bi amadekirya vekirina kerxaneya mîran kir.
Kerxaneya ku mîran ji bo jinan bixebitin di meha pêsiya me de vedibe.

Ji şaredariya Îlihê projeya 5 parkan

BATMAN- Şaredarê Îlihê Nejdet Atalay diyar kir ku dê di sala 2010'an de li taxan 5 parkan çekin û her wiha dê ji van yek li cem Girtigeha Tipa M ya Îlihê bê çekirin. Atalay da zanin ku dê navê vê parkê ji 'Parka Azadiyê' be. Atalay got ku ev park ji bo wan xwedi wateyeke giring e. Şaredarê Îlihê Nejdet Atalay, xebatênu Midûriyeta Karênu Fen û Midûriyeta Park Baxçeyan dimeşand, kontrol kir. Xebatênu wan li taxên cuda cuda dihatin meşandin. Atalay xebat şopand û bi lêv kir ku dê ev xebat di diroka ku hatiye diyarkirin de, temam bibin. Midûriyeta Karênu Fen û Midûriyeta Park û Baxçeyan li taxên weki Akyurek, İstasyon, Petrolkent, Seyitler, Guneykent, Yavuzselim, Çamlıca xebatênu rê, cade û parkan dimeşinin. Atalay çû cihê xebatê û li wir xebat şopand. Atalay wiha dirêji da axaftina xwe: "Xebatênu ku projeyen wan hatine

destnişankirin, di diroka ku me diyar kiriye de dê temam bibin. Parka ku em li ba girtigeha Tipa M çedîkin ji bo me wateyeke wê ya cuda heye. Navê vê parkê ji Parka Azadiyê ye. Di sala 2010'an de dê li Îlihê 5 park çebin. Atalay balkışand ser taxên ku heta niha tu xizmet lê nehatiye kirin û anî ziman ku ev taxana hem ji ali xizmetê û hem ji ji ali şinahiyê de, pirsgirêkan dijin. Atalay di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Projeya me ya herî mezîn projeya Parka Azadiyê ye. Ev park dê ligel girtigeha Tipa M bê çekirin. Ev park dê li ser qadeke 3 hezar û 870 metrekkare bê çekirin. Ev park ji bo me gelek bi wate ye ú giringe. Bila ev park bibe sembola weleteki azad. Di sala 2010'an de emê 5 parkan çekin. Park hemû ji dê mezîn çekibin. Em vê parkê ji bo héviyén hevalên xwe yên ku di girtigehê de çedîkin.



JI BO REKLAM ÎLANÊN WE

Hûn dikarin di Pêşketin, HAWAR NET.com an ji weşanên din ên koma HAWAR de reklam û îlanên xwe bi nirxa herî güncaw biweşînin.

têkîlî agahi@hawarnet.com